

# GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kültürel ve Sanatsal Dergi

Yıl: 1 Sayı: 7 Ocak - Şubat 1993 (iki Ayda Bir Yayınlanır) Fiyatı: 8000 TL. (KDV Dahil)



- ✓ Payiza Rûsar û Govend
- ✓ Rewşa nivisan û weşanên bı Kurdi
- ✓ Ressam Samet Aydın ile röportaj
- ✓ Jı nav Edebiyata Kurdi "Yunus DILDAR"
- ✓ Danasina helbestvanek Kurd

# GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kùltürel ve Sanatsal Dergi

## SAHİBİ VE SORUMLU YAZI İŞLERİ MÜDÜRÜ

Mazhar KARA

## YONETİM VE YAZIŞMA ADRESİ

Gevran Cad. Şair Sırrı Hanım Sok.  
Ustabaşı Apt. No: 29 Zemin Kat  
Daire:1

OFİS / DIYARBAKIR  
TLF / FAX: (83) 213 663

## BANKA HESAP NO

Mazhar KARA Adına  
T.C. Ziraat Bankası  
Diyarbakır Merkez şubesi  
353764 nolu cari hesap

## ABONE KOŞULLARI

6 AYLIK : 24.000.- TL  
1 YILLIK : 48.000.- TL

## ILAN TARİFESİ

Arka Kapak : 750.000.-TL  
İç Kapak : 500.000.-TL  
Tam Sayfa : 300.000.-TL  
Yarım Sayfa : 150.000.-TL  
1/4 Sayfa : 75.000.-TL

## DIZGI

EZGİ PRODUKSİYON  
TLF : 245 578

## BASKI

Metinler Matbaacılık

## KAPAK RESMİ

Samet AYDIN

## İÇİNDEKİLER / NAVEROK

Pêşgotin .....	1
Payıza Rûsar û Govend	
<b>DILOVAN</b> .....	2
Sitrana Lawjji Ya Lawikê Sîmoqi	
<b>Ş. NEVROZ</b> .....	3
Rewşa Weşan û Nivîsarên Bî Kurdi	
<b>S. KORKMAZ</b> .....	4 - 5
Danasina Helbestvaneki Kurd:	
"Kemal BURKAY" .....	6 - 8
Serpêhati	
<b>Y. PİRAN</b> .....	9
Zargotna Me .....	10
Kûrteçirok	
<b>Y. PİRAN</b> .....	11
Nivîskarê "Ey Reqîb": Yunus Dîldar	
<b>Latif ÖZDEMİR</b> .....	12-14
Pierû Pia	
<b>Hûmanê Çıyan</b> .....	15
Helbest	
<b>Eskerê Boyik</b> .....	16
Röportaj .....	17-21
Lihevanin .....	22
Mesele û Metelokên Kurdi	
<b>Berhevkar: Huseyinê Emin</b> .....	23
Çê Sosên Bêgi-II	
<b>Munzur ÇEM</b> .....	24-26
Ji Bo Zarokan .....	27-28
Helbest	
<b>Şelam Roni Berzencizade</b> .....	29
Musîq	
Em Azadixwaz in .....	30
Helbestên Xwendevanan .....	31
Nameyên Xwendevanan .....	32
Helbest	
<b>Ferhadê Çeleng</b> .....	33



# PÊŞGOTIN

Ji kûraniya dîl da, bî germa azadixwaziyê merhaba ji we ra !...

Merhaba xwendevanên delal! Sala we ya nû piroz be.

Em bî hêvi û bir û baweriyên pêşerojê, ji sala 1993 yan ra bî xêr û xweşi hat dibêjin. Lewra "Xêr hatin" edeteki Kurda ye û ji bav û kalan de ji me ra maye. Lê carna "nû nuhatin" li ser mirova kevira ji dibarîne. Disa ji em hêvidar in û bî xwe û gelê xwe bawer in, sala 1993 wê ji me ra bibe sala aştî û azadiyê. Em bawer in ku GOVEND di sala nû de, wê disa bibe dengê azadiyê û ev dengê ziz û zelal wê bibe kevoka aşitiyê. Lewra wê, piştî xwe spartiyê xwendevanên jir û delal. GOVEND berhemekê we ye; hûn ji hewwlekariya (garantiya) pêşerojê ne.

GOVEND bî alikariya we, va ket sala 2 ya. Ew, bî alikariya we va her roj ji roja berê xurttir dîherike nava jiyane. Hûnê vê rastiyê di nav rûpelên kovarê de ji bibinin.

Di nav kovarê de hûnê bibinin ku, guhartinek di ji heye. Berpirsiyarê me yê nûvîsî, hevalê me yê hêja Mûkerrem AYYILDIZ, ji ber ku dest bî xebateki di kir, mecbûr ma navê xwe ji nav rûpelê me derxist. Lê ew disa bî hewldanê xwe, bî hissê xwe ve bî me ra ye. Guhartinek di ji daketina hejmarên rûpelê me ye. Em carek di ji mecbur man û me rûpelê xwe disa daxist 32 yan. Lê ev kêmbûna rûpelan, wek hûnê ji bibinin di naverokê de wê tu kêmasîki dernexe ber me. Naveroka GOVENDê wê disa tîji be.

Xwendevanên hêja, hûn tev dîzan in ku weşandina kovareki Kurdi li Kurdîstanê ne rehet e. Li her alîve astengiyên mezîn li ber men in. Bî saya xwendevanên me yê hêja me vê astengiya heta nuha nekîşand. Lê ev yek nayê wê manê ku, emê ji iro şûnda nekîşînin. Bo wî ji, pêwîst e xwendevanên me alikariya xwe dehi xurttir nişanê kovarê xwe bidin. Her xwendevaneki me bila 2 kovar bistîne û yek ji bide naseki xwe. Ev yeka wê alîkarîki mezîn be, bo kovarê we.

Ji alî di, me biryarek nû stend ku ji iro şûnde emê pirtûka ji buweşînin. Ji xeynî pirtûka emê kartên pirozbahî ji derînin. Di pêşerojê de evan berhemê me ji wê bigîje destê we.

Xwendevanên hêja, wek ku em tim û tim dibêjin; GOVEND berhemekê çandî ye. Lewra ew rengê xwe ji Bircên Ameda rengin hildaye. Ew, bî we mezîn bû û wê dehi ji mezîn bibe.

Bî daxwaz û hêviyên pîr salên piroz va, bîmin in di xweşi û şahiyê de.

**GOVEND**

# PAYIZA RÛSAR Û GOVEND

- DILOYAN -

Bayê payiza ewlin, bî bêhna pelên zer û xweliya şil va dî nava biri û bijangê min ra wek guzanek bî xwin, tûj beziya bû... Havinek dîn bî tevi eşq û evinên doyin ve, wek peleteki ewrê gewr dî pîştâ çiyayhe bilind û sersipi da qelibi, wînda bû. Asogeh sorgewez, dî rengê xwinê de çilwîli.

Dî dîl da payizên zarotiyê pîrptin, bî temamê rengê xwe va. Evinên bîhûri wek tireki zîrav hîşyar bû, dî kurahiya kezebê da.

Mîrov çîma dem û zemanan ra evqas dijmin e?

Evinên bori wek tireki tûj dîl û cergê min hingavt, kezeb û gewriyê min... Lê tipên daktilyê her ku diçe sîpi dîbin, jî ber ku kaxizê sîpi reş dîbin û rûpelê kovara Govend xweş dibe... Hejmar, yek, du, sê, çar... Payizêk dîn, rûye xwe yê sar û cemdi gihand me.

Disa xwîneki sor kûçên vi bajarê kevnare bî rengê xwe yê din boyax dîke. Çend heb Çînar qelibin jî payizên bori vir da. Çend zarok şewitîn, çend govend şên bûn, çend bûk xemilîn û çend rûpel reş bûn; ev çî kîlame dibêje payiza rûsar? Ev çî mewsim in?... Payiz xwinê dîbarine, havîn xwinê dîkelîne, zîvîstan xwinê dîcemidîne, bîhar xwinhe dîxemilîne, roj xwinê dîşewitîn... Mîrov; sar û bê hîş, eşq û evin bê rûmet bûne.

Kîlama min dîzi payiza rûsar. Pelên hêşîn top kir jî nava darîstanan. Baxçê bê xwedî hîşt. Nobedaran kuşt... Evin sêvi hîşt...

Lê hêvi sar nebû dî dîl da. Tava sibehê tirêjên xwe bî dîzi daxîst kûçên vi bajarê kevnare. Min berê xwe da hêviyên nû, pîştâ xwe da bayê sar, ber bî bîrcên Amedê meşiyam... Dî devê min da meqamek nû, jî hînek kevirên bî xwin derbas bûn, jî hînek pelên hîlweşiyayî. Hîlkîşiyam sur a kevnare, lî dinê nihêrim. Dinê min nabîne, kor bûye tu dibê... Nabîne ku ev payiza rûsar cehd dîke jî bo kîlamê min jî min bîstîne.

Berfa sîpi çiyayê reş girtiyê hemêza xwe. Ev baye lî qolincê min dixê sar e, xeddar e; wey lo... Hîlma çiyayê reş jî tenê bî min dîkare.

Derbas dîbim jî hînek kûçên jar û bîrcî. Dayîk bî zîmanê zîkmaki porên zarokên jar û delal dîxemilîn in. Ev kûçe hêviyê dîbarine. Xuyaye ku bê mecalên vi welatê yê dagîrker û zorkerên wî ne. Ev kûçe hêviyên dîbarine... Lewra, çavên bî ken, rûkên geş kîlama payiza rûsar dîfetîsîne. Kîlama min geş, mîqamê min xweş dibe, dî van kûçan da.

Lambên bajêr çîruskan dîreşîne, tariya şevê bîrikandîna berfa serê çiyayê reş dîtemîrîne. Şev dî kur da hîmêz dîke bajarê kevnare. Xaniyek teng da rûyên hevala cihanek fîre diyari jî min ra dîke. Hêviyên pêşerojê zîz û zelal dîbin; Govend wê hê xwe bêtir bîxemilîne. Lewra şevên reş, mîzgîniya rojên germ in. Wî jî me bî dîl û can hîmbêz kîriye.

Êdî tîrs nema jî payiza rûsar. Karê min bî tîrsokên rûsar ra tu nine... Dê em bîmeşîn, bîra rûkê rîya me geş be û deqqe û saniye sêvi û hustî xwar û bê xwedî nemînin.

Geş bîkîn kîlama xwe, mîqamê xwe xweş bîkînl..

# SITRANA LAWIJÛ YA LAWIKÊ SIMOQÛ

were lawê, lê lê lê lê cira min dibêjît  
dibê sed car, dibê lê lê lê lê min diti bû  
eba reşeki simoqî... xwedê zani... dê min diti bû  
lî pîsta min hêdi... dimeşîya xwedê dizani  
lê lê lê lê, delilê, delilê... delilê... lo lo lo  
were lawê, kela lawê.

Î

lê lê lê delilê kurka vê sibê bî sê dengê bang dîkêt  
lê lê keçê dinê mal bab şewitiyê tu were, ramûsanekê  
jî xal û nîşanê gerdenê dê min

L

A

bo xuşe can û cesedê evdalê xwedê dê bîde  
lê lê kirivê bîla bibe fitra serê yezidê, lê lê lê lê  
delilê lo lo... lê lê kirivê ez xulamê... were lawê.

H

Î

erê lawîk çavête reş in... mîna yê çavê mamîza  
lê lê lê lê min go, her du bîskêt te zîravîn û dirêjîn  
mîna vî konê şîrtan û ereban... van enza mal bab şewitiyê  
dî min go! tu çîma bî rojê kurkê xalkê... tu wê hêdi...

Y

Ê

hêdi lî ser darê dinyayê bixemilîne  
şevî bêjî yadê rabuyîn bî şîlî ye... lo û lo lo ...lo lo lo...

N

lê lê lê were lawêv erê lê lawê kelê lawê  
çemê bêla bîrcêla lî bîn çîyayê şîngarî  
dî min go! bî şêx hadîkê gelê kurda wez ya te me  
iyê... iyê... iyê... iyê...

dî wezê şev û rojê xwedê dizani... mîtola te me  
dema vê sibê keçê mêjê lî min bî êvarîye...  
dî me go: rîşim evdala xwedê min bîde qulpan û masan  
û geza sibênî kîfa na şevêye

K

iyê lê kirivî eze hêj xwedê dizani, eze dostê xwe û te me  
lê lê lê... lo lo lo... lê lê lê...

U

kirivî min bî qurbanê  
were lawê kelê lawê, kelê lawê, kelê lawê  
çemê bêla bîrcêla bîn çîyayê şîngara şewitiyê.  
dî min go! dengê dikê porê lî hewara dîke

R

D

şaq û waqê lî qerara xwedê bî can û cesedê min ketibe  
dî wezê nakim terka bêjîna bîlînd, çavê û bîrhê reş û belek...  
bê morekê surê gulê ye heya jî aliyê qudrêtê sîmalê jî çîyayê  
şîngara şewitî...

Î

dî min go! nayê bîra min û kelê jana dilê min da  
lê bê tîfaqê, lê lê lê lê... were lawê kelê lawê  
lê lê lê... delilê delilê... kurê lawê, kurê lawê, lê lê lê lê lê  
kirivê min bî qurbanê.

*Ev sitran, jî hejmara 1539, ya rojnama Hevkari, ydîroja 7.9.1992 da hatiye wergirtin. Ji alî Ş. Newroz va jî tipên Erebi hatiye vegerandin bo tipên Latîni.*

# REWŞA WEŞAN Û NIVISARÊN BI KURDI

S. KORKMAZ

Di sazûmana jiyana abori da prensîbê heye, jêra dibêjin "derpêş û daxwaz", ango "arz û talep". Çerxa ber-kêşanê li gora vê regezê (ilkê) dizivire û tê badan. Daxwaz, derpêşê diafirine, lê derpêş ji daxwazê zêde û cûr be cûr dike. Di bazara aboriyê da maleki ko daxwaza wi tuneb, an rabû be, ew mal di stuyê xwediyê xwe de dimine û di barxana de mah-kumê rizandinê dibe. Karbidest, ko nexwaze bixisire dibê guhdariya piyasê bike û li gor daxwaza civatê mal û çêkirina biafirine.

Ew prensîba li jor pir-hindik ji bo rewşa çande yi û konevani ya civatê ji tê gotin. Civat û çalakiyên rewşenbiri, nivisandini û xwendin divê bersiva hev bidin. Ango, daxwaz û derpêşê hev

bin. Ji vê bonê rêzanvan, pêwist e civata xwe ji her ali ve û zor baş nasbike. Civat dixwaze çî bike, çî hin bike û çî bixwine, divê baş bêne çî kirin û li gora daxwazên civatê berhemên çandî û nivisarên konevani bêne weşandin û çapkirin. Lewra ko, ronakbir goh, çav û mejiyê civatê ye. Ronakbir hinker e; rê û rêçika rasti û paki şani civatê dide. Lê gotin û nivisandin têr nake, kîrî ji lazîm e. Wexta gotin û

kîrî ronakbir an konevan hev negrin, wê demê rûmetik ji nivisarên wi re ji namîne. Baweriya civatê bî ditiniyê wi rêzanvani nayê û kes li pey wê rêçikê nameşe. Rewşenbir ne ewe ko gotina xwe dibêje, an nivisara xwe dide weşanxanê û li mala xwe vedikeve. Rewşenbir ewe ko xwediyê gotina xwe ye û roja teng li pêşiya civata xwe ye.

*Kî dikare bêje rola lenin ji ya Gorki an Dostoyevski mezinare, li ser guhartina civata sovyet. Dîsa kî dikare bêje, tîna Viktûr Hûgo ji ya ihtilala Frensê kêmtare û ew kîye ko dibê tesira kovara "Hewar" an "Mem û Zîn" ji serdildana Şex Seid paşda tîre. Her rolek di tanga xweda grîng e û ji bo hev pêwist e. Ev yek ji divê wîha rast bê zanin. Zor û zanin di vê rêda bira ne. Zor, çiqas grîng be, zanin sed hewqas pêwist e. Zor ne armanc e, bo serkeftina armanc û mebestê pergal e. Lê zanin armanc e, armanca mirovbûnê a herî grîng e. Zor demî ye, zanin payidar e.*

Tiştêki din ji heye; Ciyê rêzanvan û rewşenbir nava gelê wi ye. Wexta ko jiyana rêzanvan û gel ji hev veqetandi, dûr û cûda be, sibê de ditini û baweriyên wan ji ji hev dûr bikevin. Yek teminatek wek-heviyê heye, ew ji heta dawiyê jiyana di nav hev de parvekiri ye.

Gazinda gel ji rewşenbirê wi heye. Rewşenbirê me gelek cara gel bî

serê xwe hiştine û ketine derdê can û malê xwe. Iro ji rewş zêde neguheriye. Wek sermiyandar û dewlemendê Kurda ronakbirê me ji qîma xwe bî jiyana welat û halê gel naynin. Wexta li Çolemergê (Hekkarî) bîjin kîye ko nav û dengê wan seh bike; xetera mîrînê ji xwe li wê bihêle... Bira kes nexeyide û bî taybet negre ser xwe, lê ez di wê ditiniyê de me ko şexsiyeteki pari navê wi derketi (Tixtor, Ebûqat rêzanvan) êdi li xwe

nagre li welêt bîmine. Lewra ko hempa yê wi gişt li Enqera, Stenbolê ne! Ev rewş wani naçe. Wexta seradê hatiye. Rewşenbirê gel divê hêdi hêdi bişiqitî nava gel û jiyana zehmetkêşî parikin. Yê bînbêjîng bira di ciyê xwe yê nîzîm de bîminî, ew çal gelek li karekterê wan tê!

Di derhaq xwendin û pêçûna weşan û nivîsarên Kurdî de gazînd û rexneyek zirav ji gel ji tê kîrîn. Qasî tê xuyakîrîn tî-  
raja weşanên

bî Kurdî gelek kême. Ev hejmar ne sed yeka (% 1) rojname xwende yê Kurda ne. Çima? Gelo pereki zêde lê diçe. Na.. Ez di wê dîtîniyê de nînim. Mîroveki hemî rojname û kovarê bî Kurdî sere-

rast pê here bira sed hezarê wi here, ko ew ji rojê sê hezar dîke û hêj nake perê rojnameki Tîrka ko têde tîji dijîmîni li me tê kîrîn. Ev bêpîrsiyarî ye û ji netewabûna xwe dûrbûyî ne. Mîroveki, bî tenê ji bo piştîgîriya manewî bîmine dişa divê weşana Kurdî bîstîne û bê şîk divê bîxwîne jî. Özal divê "Kurdîti nemaye, Kurda zîmanê xwe jîhempa yê wi gişt li Enqera, Stenbolê ne! Ev rewş wani naçe. Wexta seradê hatiye. Rewşenbirê gel divê hêdi hêdi bişiqitî nava gel û jiyana zehmetkêşî parikin. Yê bînbêjîng bira di ciyê xwe yê nîzîm de bîminî, ew çal gelek li karekterê wan tê!

Di derhaq xwendin û pêçûna weşan û nivîsarên Kurdî de gazînd û rexneyek zirav ji gel ji tê kîrîn. Qasî tê xuyakîrîn tî-  
raja weşanên bî Kurdî gelek kême. Ev

heji bir kîrîne. Mektebê Kurdî vebîrîn jî kes zaroyê xwe naşîne". Ev yek wîsa be jî divê em dilê neyarê xwe xweş nekin. Jî zîman û çanda xwe ra xwedî derkevî. Bîxwînî û bîdî xwendî. Her maibateki divê Rewşene kî, Govende kî, Welate kî, Azadiye kî, Berheme kî, Nûdeme kî bîstîne û li nav mala xwe peyda bîke.

Civat çîqas pêşve diçe, rol û pêçekên komalî jî hev zêde û belav

dîbî. Wek berê êdî hewce nîne her kes bîhe v re rahêje kareki. Hinek bî pênûsa xwe, hinek bî tîfînga xwe, hinek bî keda xwe, hinek bî perê xwe, her kes di tanga xwe de gîring e û pêwîst e.

Kî dîkare bêje rola Le-

nî jî ya Gor-kî an Dostoyewski mezinîr e, li ser guhertîna cîvata Sovyet. Dişa kî dîka-re bêje tîna Victor Hugo jî ya ihtîlala Fransê kêmtîre? û ev kîye ko dibê tesîra kovara "Hevar" an "Mem û Zîn" jî serhîldana Şex Seîd paşda tîre. Her rolek di tanga xwe de gîring e û jî bo hev pêwîst e. Ev yek jî divê wîha rast bê zanî. Zor û zanî di vê rê de bîrane. Zor çîqas gîring be, zanî sed hewqas pêwîst e. Zor ne armance, bo serketîna armanc û mebestê pergale. Lê zanî armanc e. Armanca mîrovbûnê a herî gîring. Zor demîye, zanî payîdar e.

Tîna xwendî û nivîsandîne di civatê paştamayî de kême. Em dibê nebin jî wan civata. Iro pîvana şarezayî yê xwendî tê qebûl kîrîn. Bira kes vê rastîyê jî bira xwe nebe.







## DANASINA HELBESTVANÊN KURD:

### "KEMALBURKAY"

**Kemal Burkay** di sala 1937'an da li hêla dersimê, "Dibran" da haliye dinê. Li Kurdistanê Tirkîyê di wê salê de li doreberê Dersimê serhildaneke mezin destpêdike. Roma reş di nav salan da sondeke mezin xwaribû ku gelê Kurd ji ortê rake.

**Kemal Burkay** zarotiya xwe li gundên Dîrban Hu Canikê derbaz kir. Wi dibistana pêşin li wir kuta kir. Ew di nav van salan da tengasiyên mezin dibine, ew herro pêxas û ti-birçî radibe diçe vê dibistanê. Bavê wi merveki bê erd bû, wi dersdari dikir.

Nivîskar, helbestvan û ronakbir **Kemal Burkay** li Akçadaxê dikeve zaningeha bi navê "**Köy Enstîtüsü**" (**Enstitüsüya Gundiyân**). Ew dinav van salan da dibe xwendekarekî jir û jêhati. **Kemal Burkay** di vê zaningehê da şev-ro dixwîne, zêna xwe pêşta dibe, paşi vê yekê **Kemal Burkay** dibe xortekî hîşyar,

serwest û çavvekirî.

Paşi kutakirina vê xwendegêhê ew dikeve zaningeha Dadigehiyê (hukuk). **Kemal Burkay** di vê demê da destpêdike gelek çirok, serhati û helbestan dinivise. Ew cure cure kovar, rojname û pirtukan dixwîne û westan çîye nîzane. Ew di nav salan da ji aliki da diçe zaningehê, ji aliki da ji dersdariyê dike.

Di sala 1965'an da **Kemal Burkay** dikeve nav cêrgên (refên) "**Partiya Karkerên Tirkîyê**" û ew gelek salan dinav vê partiye da dixebite. Ew bi dileki şa xwe pêşkêşî serkeltina doza karkerên Tirk û Kurd dike. Pêşiya her tişti sosyalizm bo **Kemal Burkay** dibe bawerike mezin.

**Kemal Burkay** gelek rojên tirş, tal û bi jehr ditiye. Hêzên kolonyalist tu west dest ji pêşira wi berne dane. Di sala 1966'an da bendeke **Kemal Burkay** di kovara "**Yeni Akış**" da derdikeve, ji ber vê bendê

ew tê girtinê û 4.5 mehan di zindanê da dimine. Paşi sala 1971'an ew du caran disa tê girtinê û ew 9 mehan ji azadiya xwe dûr dikeve. Paşê dema ku zozdesti yên ku li ser **Kemal Burkay** zêtir bûn, ew çû du salan li derwayi welat ma. Hîsreta welat li ser dilê wi dibe kevireki disekine. Lê wi hertim bina xwe firegirtiye û bawerîya xwe tu west wunda nekiriye.

Ew du salan şunda ji derwayi welat vedigere tê welatê xwe. Di nav van salan da bir û baweriyên sosyalist li Kurdistanê bi lez belav dibûn. Di sala 1974'an da li Kurdistanê Tirkîyê "**Partiya Sosyalist a Kurdistanê Tirkîyê**" hat avakirin. **Kemal Burkay** bû himdarekî (rikindar) vê Partiyê. Wi ji bo azadiya Kurdistanê bi gelek hevalên xwe va tevayî di nav baskên vê partiye da digirtin.

Çawa di warê politikayê da, usa ji warê



edebiyatê da **Kemal Burkay** bûye miroveki navdar û jêhati. Cara pêşin di sala 1967' an da helbestên wi bi navê "Prangalar" hatin çapkirin. Di sala 1976' an da pirtûke nû ji aliyê **Kemal Burkay** da bi navê "Dersim" tê çapkirin.

Nexş-nigar û reng-awazên helbestên wi bi girani Kurdistan e. Ew bi di-leki na, hezar dili li ser welatê xwe bengine. Di nav xelên wi da eş-birin û derd-kulên gelê Kurd bi jêhatike mezin va hatine nitirandinê. Wi di helbestên xwe da her tim hêvi, baweri û gumana xwe her tim parastîye. Xurtbûna şeng-şepaliya xelên **Kemal Burkay** bedewiya helbestên wi nişani me dibe. Ronahiya rojên delal û rojên azad di nav helbestên wi da baş di çirûse. Nexş û xemlên rengin va helbestên **Kemal Burkay** li ser himên mi rovhîzi, we lathîzi û li ser himê biratiyê gulvedane.

Ji ber zordestiyên hêzen kolonyalist **Kemal Burkay** di gelek nivisarên xwe da navê xwe yê rasli her tim veşatiye. Di nav gelek rojnâme, kovar û pirtûkan da bi navê "**Baran**" **Kemal Burkay** zelîşt nivisiye. Wi bi vi navi du pirtûkên Kurdi wergerandiye zmanê Tirkî Ji wana yek deslana "**Mem û Alan**" e. Ev pirtûk di sala 1977'an da li Kurdistanê Tirkîyê hat çapkirin. Di sa **Kemal Burkay** bi navê

"**BARAN**" helbestên niviskareki Kurdên Sovyetistanê- **Eskerê Boyik** di sala 1979' an da bi navê "**Dağ Çiçekleri**" (**Kulil-kên Çiya**) wergerande zmanê Tirkî. Wi di nav wegeran da zmaneki zelal, paqîş û dewlemend xebitandîye.

Gelek pirtûk, bend û broşûrên wi ji bi nave din va hatine nivisandinê. Helani niha di nav rûpelên gelek rojneme û kovarên Kurdi-Tirkî da pîr ef-randinên **Kemal Burkay** ci girtine. (**Özgürlük Yolu, Roja Welat, Çıra, Ye-ni Akış, Sesimiz, Dengê Komkar, Roja Nû, Yeni Toplum, Varlık, Yarına Doğru, Papyrus**)

**Kemal Burkay** di sala 1964' an da romanek bi navê "**Yaşamanın Ölesin de**" nivisiye. Ev romana di nav rûpelên rojnema "**Valan**" da li **Tirkîyê ke ri ke ri hatiye** weşandinê. Usa ji bi Kurdi- bi Tirkî **Kemal Burkay** bi navê "**Dawîya Dehaq**" liyatrok pêkaniye. Di vê listîka biçûk da ser qevrîmandî na Newrîzê hatîye sekinandin.

**Kemal Burkay** bi navê "**Sosyal İmperyalizm Sorunu ve Türkiye'de Maoçu Akım**" (**Pîrsa İmperyalizma Cıvaki (Sosyalî) û Bir-Baweriyên Maoçiyân li Tirkîyê**) pirtûkek di sala 1976' an da nivisiye. Wi di vê pirtûka xwe da çewt, şaşî û xelatiyên "maoçiyân" nişan daye.

Ewên ku dixwazın zmanê Kurdi hinbin,

**Kemal Burkay** bo wan pirtûkeke **Dersim Zmanê Kurdi** nivisiye. Ev Ef-randîna giranbihayê di nav wedeki kurt da wê bê weşandin.

Ev nivisara ji pirtûka "**Be-ravoka Helbestvanên Kurd**" hatîye wergirtin.

Weşana **KOMKAR**, sala 1982.

#### SPARTAKUS

Jin stranek e Spartakus  
Derbas dibe û diçe  
Gava roj bilind dibe li ser  
çiyên

û pelên mor ledixin li  
beravan.

Jin stranek e Spartakus  
Zaroyên piçûk û jinên pale  
dibêjin  
Li wir, li deştên Trakyê.

Azadi wek tayrek li ezman  
Wek stranên çavên  
Varinya ne

Ew keçika dil, Britani  
Ew kulilka zozani  
Wek kenek bi jan e  
Li ser rûyên gladiyatoran  
Gava xwîna wan tev li axê  
dibe

û dimrin bi mêrani...

Ew çi dizanin dostaniyê,  
Çi dizanin biratiyê,  
Bonâ yeki din mirin.  
Ew çi dizanin

Spartakus!  
Gava rabûne piyan kevîr û  
kuçên

Makedonya û  
Lombardiyê

Nexweş û kal û keçên  
ciwan  
Bo azadi wek al dibû porê  
wan

(...)

**Kemal BURKAY**

## VAN ÇIYAN ÇI DİTİN, ÇI NE DİTİN

Kemal BURKAY

Van çıyan çı dıtın, çı ne dıtın  
 Bı milyon sal  
 Şılı û şepe  
 Avên dın singê wan çırândın  
 Bı roja wêlatê jêrê şewıtın  
 Ba û bahozan  
 Dı dırb û geliyan da lorandın

Bı milyon sal  
 Kaniyan jê da der  
 Daran bejn da  
 Lı hev qelwın bi û şilan û dırık û gûz û tri  
 Dı dolên wan da  
 Lı berwar û zozanên wan  
 Pez çêri, gur zûri  
 Kılâmên xwe gotın mêş û mûriyan

Rovi û pıling û hırç û insan  
 Bı milyon sal  
 Şer kırın lı geli û quntarên wan  
 Bı pençe û dıran  
 Bı kevir û ço û tir û kevan  
 Bı şûr û mertal  
 Tıfing û top û teyaran  
 Van çıyan çı dıtın çı ne dıtın

Bı kulbe û bêr û gısın û motor  
 Mırovan tov rıjandın  
 Lı dor avên şın-zelal  
 Balcanê sor, gındorên şirin  
 Ceh û genım  
 Bırinc û pembu û titûn  
 Ağır dadan, hesın kutan, govend gırtın  
 Bı hezaran sal..

Ev çıya hım kal, hım cıwan ın  
 Havın e, dı çalan da ağır dıbare  
 Ax dıprje wek tendûrê  
 Dol bı dar û ber ın, keskê bıhar ın  
 Lı jori zozanan berf  
 Dı mêrgan da kulikên rengin  
 Çemên geliyan bı kef û kopırık û dilan ın  
 Lı çıyan hım şer, hım aşti  
 Hım mırın, hım jıyan

Van çıyan çı dıtın, çı ne dıtın  
 Gûti û Kasi, Hûri û Lolo  
 Xaldi û Ermen, Akad û Aşûr  
 Semiramis û Naramsin  
 Keyxusrev û Dara, İskenderê Mezin  
 Rom û Erebe û Moxol û Ecem  
 Cengiz û Xulagû, Teymûrê Leng  
 Úsifê Reş, Hesenê Dırêj  
 Ew Tırkmenên xwinrêj  
 Jı Tırk û Tatar, heya İngılız  
 Bı sedan zordest, talanker û çıl dız  
 Lê hemû hatın çûn, disa ev Kurd man  
 Kurên Hûri û Lûri û Kardox û Midan  
 Ey dayka Kurdistan!  
 Bı hezar deng, hezar reng  
 Ú sing û berê te ne ev çıya û zozan

# Serpêhati

## KURÊN BÊXÎRET XUDÊ

### NEDE KESÎ

Y. Piran

Êvar e, roj êdi ber bî ava diqulibe. Siya zinarê nêriya daketiye jêr. Koçer li ser sewkiya ber koşka xwe rûniştiye çay vedixwe. Şivanê pez tê rasta dîngê gazi dîke: "Xalê Koçer, kara we ya belek wînda bû. Ez dîgerim-nagerim, nabinim..."

Koçer, çay vexwarinê ci da dihêle û gazi kura dîke, dibêje:

- Lawo, kara me ya belek wînda bûye, lez bîkî wê bîbin. Hûn gerekê karê bîbin û ji min ra binin...

Qet xema kura nine. Guh nadin bavê xwe. Xwe xwe ji hevra dibêjin: "Hela bavê me bînhêre, bona kareke kelax çav lê ye, vê êvarê me serê rêya bixe." Kurê Koçer li karê nagerin, diçin ji xwe ra xew dîkin.

Du-sê roj şûnda şivan car din xeber tîne, dibêje:

- Qurban, wele işev miha qer wînda bû.

Koçer car din gazi kura dîke, dibêje:

- Kuro, zû herin mihê bîbin. Ev çend roj ewe kar nedit. Qe nebe mihê bîbin...

Kur weke berê guh nadin bavê xwe. Li

ber xwe dikine piste-pist, li mihê ji nagerin. Diçin nava gund dîgerin.

Çend roj şûnda darê xwe dîde destê xwe tê malê. Koçer jê dipirse, dibêje: "Lawo, xêr e tu hati mal, çima naçî ber pêz? Gelo te kar dit an na?"

Şivan dibêje:

- Xalê Koçer, wele cerdê avête ser pezê te, kerî tev bîrin, tiştêk nema...

Koçer car din gazi kura dîke, dibêje:

- We hê ser-beratê karê neditiye? Hûn nîzanin gelo ew kar kê bîr? Hey Xwedê we bistine...

Kur bî hevra dibêjin:

- Bavo, cerdê malê me tev bîr, tiştêk ne-maye. Tu hê qala karîkê diki?

Koçer li kura dîke qirini, dibêje:

- Lawo, ez ji zannî cerdê keriyê min gîşk bîriye. Ku hûn wextê da li karê bigeriyana, we kar bîdita, waha nedihate serê me. Talan keryê me ji nedibîr... Kurê bê xîret Xwedê nede kesî...

## BEND-DÏLOK

### Pieserardiş: Hûmanê Çıyan

Dayê ez birindara  
Birinê mı xedara  
Ni karda niz xencerâ  
Semêd yey kênay şara

\*\*\*

Ez ha şena xeribê  
Semêd ma feqirê  
Nioyena niozi ninna  
Heq xwî helal bıq Dayê

\*\*\*

Mı radawo, tu radawo  
Hesron çimon mecalê mı birnawo  
Destmalê sêrdeston mı helsınawo  
Emser hot sêro  
Ez tu sêr biya qal-xebero-qulquliko

\*\*\*

Ez bizon'do, tu gayon'do  
Ma çengle bıko mon bêriyon'do  
Şar-herkes hanuk xwîr kar-gure'do  
Ezo tu hanik muşeredo

\*\*\*

Pako hor o astareyi  
Sêr na Sarcona mierat pier qışleyi  
Kênay kutik, kênay terês  
Tu zerê mı helsınaya, kerda toqê saci

\*\*\*

Zerê mino zerê gayi  
Zerê tuwo zerê bızı  
Ga çerenû vêk na vayi  
Kênay kutik-kênay terês  
Ez tu ser biya qal-xebêri

\*\*\*

Vêng tu weşo, vêng tu weşo  
Mı kerd gueştari, kerd xwî gueşo  
Do'yê Kuermo pier biya heşo, biya vergo  
Em ser hot sêro ez tu ser biya yo torino

\*\*\*

Hêwax mino diarê Gilonaziri  
Tu qam veta sê nêrgizi  
Tu Hûmay kena, tu miser vindi  
Ez eskerê ra biêr o tu xwîr biwazi

\*\*\*

Pirdê Pali pirdo pako  
Ponc waxt nimac serî farzo  
Cay mino waşti mı serid rako  
Şêtono o fesado niverdawo  
Tijê sêri sibay ma ser ako

\*\*\*

eman eman eman eman  
eman eman mı derdindir  
Tu sê milçiko viç-viçnena  
Sê werdegon wil-wilnena



\*\*\*

Tu va se, yey va se  
Şima pia qal kerd esse  
Çimon tu'ra asien  
Tu vat êyo, yey vat ni

\*\*\*

Lû - lû  
Pa lengû  
Çim zengû  
Kergê xalo

Kuzi berda  
Pê bononid werda  
Ni este, niz pueste  
Barê xırabon qın - esti

\*\*\*

Mino diari ini Gazi  
Delalê tu bermena kul o nazi  
Sebir bıkir heton ez xeribêra biêr  
Pê edeton kal-piro tu xwir bıwazi

## kurteçirok

# TU BAVÊ TE NELKÊŞ BÛ

Y. Piran

Navbera Patnos û Qerekilîsê tiji gur in. Ji bîharê hetani payîzê bi heywanan ra şer dîkin.

Rojek li Geliyê Xamûrê, ber devê Çema Mûradê gurek rastê hespek tê. Gur hêdi hêdi guhê xwe fit dîke, ber bi hespê dîçe. Niyeta xwe li hespê xırab dîke; dil heye hespê bixwe. Dema ku hesp guhfitkirina gur dibîne, lê dîkeve şikê. Zane ku xılabûna wi ji destê gur tunne, gurê wi bixwe. Paş hın mitalan, hesp gazi gur dîke û dibêje:

- Qet xwe vi ali wi ali nevêje. Ew guhfitkirina te ji bo xêre nine. Ez zanım tuyê min bixwi. Beriya xwarinê daxwazek min ji te heye. Gelo tu kari daxwaza min bi cih bini?

Gur dibêje:

- Bêje, ku xwesteka te çi ye? Ezê xwesteka te binım cih. Bila tu kul-keser bi te ra ne-

çe gorê.

Hesp dibêje:

- Ev deh sal in ku ji destê vê nelê nîkarım dî dê ra biçım; her roj dikulım. Ez hêvi dikım tu vê nelê ji sima min bıqşini, paşê min bıxwi.

Gur dibêje:

- Bila be, qet ji min ra zehmet nine. Hema daxwaza te ey bu? Tu zû lingê xwe bilind ke, ezê nel ji sima te bıqşinım...

Hesp lingê paşiyê bilind dîke, wextê gur devê xwe dirêj dîke ku nel ji sima hespê bıqşine, hesp refesek li netka gur dixe û gur dilorê erdê dîke.

Gur bê hiş dîkeve, hes direve dîçe û ji gur xılas dibe.

Gava hişê gur tê seri, radibe ser dêla xwe rûdinê, bi xwe xwe dibêje: "Ça xweş bû. Tu bavê te nelkêş bû, ku tu ji neklêşi diki!..."

## NIVISKARÊ MARŞA NETEWÎ YA GELE KURD:

YUNUS DILDAR (1918-1948)

LATİF ÖZDEMİR

Jiyaneke kurt, lê bi nîrx û hêjaya jiyana, DILDAR. Ew di nav agirê şoreş a Kurdistanê Başûr ku di sala 1940 de geş dibû, mezîn bû welatparêziyê naskir. Bi helbestên xwe, çelengiya xwe piştavanek dîlsoz û serkarek bê tîrs bû. Dildar xwendina pêşin li bajarê Raniya ye kuta kir. Paşi ji li Hewlerê devami xwendinê kir. Ew di sala 1918'an de li Koysancaxê hate dinê. Huquqzan û diroknas Dildar, bi helbestên giranbûha di demekê kurt de li Kurdistanê Başûr û Rojhilat, nav û deng da. Xwendevanek şareza, zanayek hêja bû Dildar. Bi şahiya damezrandina Komara Kurd li Mahabad, wi ji bi helbesteki pirozbahi û dilşahiya xwe daxuyan. Ev helbest "Ey Reqib" bû, ku paşi bi biryara Komarê ev helbest hate ristîn û bû sîrûda netewî, angoma marş a millî ya gelê Kurd.

Ev helbestvanê hêja bi zaravayê Sorani dînivîsand. Dildar yek ji nivîskarê kovara Gelawêj bû. Helbestên wî weki tir dilê dijmin dişewitand. Mirov dikare bêje ku "Ey Reqib" û "Kurdistan" ji aliyê hemû welatparêzan ve hatibû jiber kirin.

Yunus Dildar di halekê de ku helbestan dînivîsi, wî, her wiha wergervani jî dikir. Klasikên Cihanê, wek La Fonten û La Martin werdigêrand zimanê Kurdî. Ew bi dilekê newesta di xebata pêşdeçuyîna civata Kurd de wek kargerek şev û rojan dixebiti, lê mixabin ku dilê wî nekari zêdetir wî xwedî bike. Dilê şad di ciwani û şiriniya

jiyanê de ji Dildar ciwîda bû û wî mirovê jêhati di 30 salîya wî da tenê hişt, Dildar sala 1948 çû ser heqiyê.

Yunus Dildar zaningeha dadperweriyê li Bexdayê kuta kir. Çend sal danêri û dadzaniti kiriyê. Ew meraqdarê tarîxa Ewropa û Rojhilatê bû. Di wî wari de gelek lêkolinan xwend, zanariya bira xwe pêş da bir. Ew ji Mehmet Emin Zeki gelek hêz stendiye. Kiteba M. Emin Zeki bi navê "Diroka Kurd û Kurdistan" tesîrek mezîn li ser Yunus Dildar daniye. Ji helbestên Hecî Qedri Koyî, Kurdî, Bêkes û Ziwer gelek hez kiriyê ku di helbestên Dildar de bandura wan şairan tê xûya.

Yunus Dildar di helbestek da Kurdistanê û delaliya wî welatî wî hatine ziman:

*"Kurdîstana xweş,  
Nîştimana Ciwan  
Qibeyê min i tu, bê guman  
Çavên min li çiyayên te pişkînin,  
Bûne inê  
Jiyana baxên te  
Dengê bîlûra şivanan te  
Zîr qû baça te ya ciwan,  
Qespa kewan  
Li pala te  
Xweşêna ava newalên te  
Ew herî di guhê min da ne  
Ez girtiyê evîna şerê dîla me  
Ne ji nu v e ş li v e axê mezin bîme  
Min bi xweşvîni,  
Bêê Kurdistan  
Te min xuliqand*

*Te min xulî çand û*  
*Te jin da min,*  
*Xweş jiyana min*  
*Xweş jiyana te ye*  
*Êşa jiyana min*  
*Roja şina te ye*  
*Lewra Kurdistan*  
*Nîştimana ciwan*  
*Tu qblehê dili, bê guman"*

(Ji zaravê Sorani wergeri)  
 Helbestên Dildar weki sirud û diruşma ne. Her yek pêtek ji agirê ş oreşê ne.

Zîmanek dewlemend û xweş ahenge Dildar. Ew bengînê welat e. Her helbestên wi weki stranek azadiyê ye. Lê mixabe ku ev şairê hêja zu deng bri.

âvê çend helbestên Dildar evîni: Ey Reqîb, Kurdistan, Ey Bayi Şemal,

Bo Kowari Ronak, Mînalî Hîwa, Titunewan, Kapîri Awdêr, Du Sîwar, Çend û Çûn, Malwêran, Hesab, Hesabkirdin, Tawî Kurd û ê din.

Yunus Dildar, ji aliyek ve di kovara miri ya Komarê de dinivîsand, ji aliyê din va ji, ji cihanê agadar bû. Wi car caran ji axa Kurdistan pirozbayi dîşand ji bo rojnama Ronahi, ku di sala 1945 de derdiket. Di helbestek xwe da wiha dibêje:

*"Rcnaki çendîn nawi to le kir min xoş e*  
*Dili alem be saye to be çox e*  
*Tariki roj darkat Rcnaki*  
*Beilm û fen û ruxsari pakî"*

Yunus Dildar, ji hatin û duweroja Kurdan tu cari bê hêvi nema. Ew bi başi bawer dikir wê roj bê û Kurdistan azad bibe. Iro li Raniya û Huwler û Koysancaxê bayê azadiyê dibare. Lê mixabe ku Dildar negihîste van rojên xweş, di ciwaniya emrê xwe da koç kir çû, gelê Kurd ji awaza xwe ya şirin

êtir pêpar hişt.

Di helbesta "Lawî Kurd" da Dildar rewşa xortên Kurd û rewşa kurdistanê diqirine.

"Tu dîzani ey welat, çima iro bê beş i,  
 Çima destê şevê nişani te dike nema reş i,

Bêjim ji te ra, esbabê mezin ê zillet û çarereş i

Xortê Kurdan, hê li wextê mey de dikin xiretkêş i

Dema ku bade tê meclisê, navê Kurd tê ser zîman.

(...)

Çeka her miletek tenê li sîtuwê xortan e  
 Roja xebatê, hêvi û fikir beşin karê xortan e

Tev hemi kirne kul û birin, ji derd û rencan e

Xortên me ji her li demê mey da dikin xiretkêş i"

Bî rasti ji Dildar ne xortek bê xiret bû. Lê wi bê xiretiya gelek kesên nezan didit û hêrs dibû. Xortên welat ji welat ra gili dikir. Dîzanibû ku di xebata azadiyê de vezifa xortan gelek zêdeye. Dîxwest ku xortên welat seha berpirsiyariyê bi cih binin û barê piştta xwe bîzanin. Di kutahiya vê gotarê de marşa milli ya ku Dildar bi diyari daye gelê Kurd, ji bo yad û biranina vi helbestvanê hêja, em carekî din bîxwinin û "Ey Reqîb" fêri hemi kesî bikin.

*"Ey reqîb her mawe çewmî Kurd zîman*  
*Nay şikênê çaney tçpi zeman.*  
*Kes nelê Kurd mîrdû wê, Kurd zîndûwê*  
*Zîndûwê çet nanewê alakeman.*

*Lawî Kurd hestaye ser pê wek dîlêr,*  
*Sa be xûn nexşî deka tacî jîyan.*  
*Kes nelê Kurd mîrdûwê, Kurd zîndûwê*

Zinduwe çet nanewê alakeman.

Eme rdey Midyaw Keyxusrevîn,  
Dinmanê ayinmane Kurdistan  
Kes neê Kurd mirduwe, Kurd zinduwe,  
Zinduwe çet nanewê alakeman.

Eme rdey rengi sûr û şerîşîn,  
Seyrike xûnawîya rabur duman.  
Kes neê Kurd mirduwe, Kurd zinduwe,  
Zinduwe çet nanewê alakeman.

Lawi Kurd hazir û amadeye,  
Gıyan fidane, gıyan gidane, gıyan fidane  
Kes neê Kurd mirduwe, Kurd zinduwe,  
Zinduwe çet nanewê alakeman."  
(Bî zaravê Sorani)

Xweş halin ku ev sırûda Dîldarê  
nemir wek marş a millî di nav kurdan  
de li seranserê Kurdistanê tê xwendin.  
Em hêvidarin ku ev sırûd di merc û  
zirûfên xweş tir da, bi dengên bilindtir  
ji hetani hetayê were xwendin.

## PÊKENI-PÊKENI-PÊKENI-PÊKENI

### PIVAZ Û ŞEKIR

Jinika zaza bi gedê xwe mabû  
heyri, gedê bêar ariyabû û bi tiştêki  
aş ne dibû. Cinar ji bi tu gıriyê sebi  
hesiyabû û pê aciz dibûn. Xatûnek  
bajari serê xwe kir pencerê û gote  
dayika gebê;

- Êra xwe'ê seriki şekir bide, bira  
hewqas negri, te ji û xwe ji aciz  
neke.

Diya sebiyê;

- Lê lê xwe'ê min seriki pivaz daye  
aş nebû, icar wê bi şekir aş bise-  
kine.

S. KORKMAZ

## ROJEVA EVINÊ

(Ozan 1m Ez)

Tenê taritiya xwe diji  
her miroveki

Ez ya hemû mirovan  
lewra ozan 1m ez

Zarok, kulilk û çivik tene kuştin  
Refên ker û kora nabihizin  
Çavê wan şil nabe ji bo  
hezkiriyê wan  
lewra her ji xwe hez dikin ew  
Evinên wan, êvarên wan  
ne ziz û zela 1m

Ez hêşiran dibarinim  
lewra ozan 1m ez

Di heps, zindan û zincîran de  
Xortên ciwan dihelin  
Mal bê deng di minin,  
xema keseki nine

Çavê min li şêmûkê,  
çavê min li rê û dirbê

Guhê min li dangan  
Ji singê min diçete dengê çivikan  
lewra ozan 1m ez

Ev şer bi evin dixemile  
Ev e ji me ra tê gotin  
A di dil da diherike ev e  
Ev e diherike nava milê min  
bi giraniya dem û çaxan  
lewra ozan 1m ez

Hilma zêviyê din e, hêşinayi  
ya çiqilên ajdayi din  
Ji ewqas bedewiyê ra tebat nakim  
Dil di nava pêtên agir da paldayi  
lewra ozan 1m ez

M. KARA



# Pierû Pia

Pierû pia  
Pierû pia  
Pierû pia

May o pi  
Way o bira  
Kıc o pil  
Cını o ciamierd  
Pierû pia

Pierû pia wirzên yobên  
Pierû pia paşt pieşonên  
Yo şefeş sûr, zelalid  
Pierû pia sarı berzkên  
Ma xwı verşon ini mûrdaron  
Ma feteln ini zuardaron  
Ma çiniek ini faşiston  
Ma welat xwı azad bık  
Ma zerê xwı pê şabık

Pierû pia  
Pierû pia  
Pierû pia

Wa zelwon zel bıceno  
Wa defçi def bıkuro  
Wa pierû guvend bigro  
Dêyron welat ma vaco  
Na guvendê azadiya  
Na guvendê ambaztiya  
Guvendê yobieyê mulletê maya

Pierû pia  
Pierû pia  
Pierû pia

Pierû pia wirzên yobên  
Pierû pia paşt pieşonên  
Yo şefeş sûr, zelalid  
Pierû pia sarı berzkên  
Kelepçê ini faşiston haw deston ma do  
Nirê imperyaliston haw mıl ma sero  
Şar welat ma şılraw, talon kerdo  
Sêr-bın erd ma pierû taşt berd werdo  
Ni verdon ma bınûso, niz verdon ma bıwono  
Zoni mayo weşo delal marız kilit kerdo

Pierû pia  
Pierû pia  
Pierû pia


Hın besa wirzên xwı ser  
Deston xwı bıdiên pieser  
Bı xelsınên ina Newrozê wesar  
Wa ço memon vêr diesond  
Wa ço memon bın destond  
Ço memon sêwi, bi may-bi pi  
Ço memon vêşon-têşon o zıt-bit  
Ço memon bi gure o bi kiye  
Wa pierû bıwan o bınûs  
Wa pierû bizon o bımûs

Pierû pia  
Pierû pia  
Pierû pia

Pierû pia wirzên vacên  
Ma niwazên faşiston  
Ma niwazên mûrdaron

Ma niwazên  
Ma niwazên  
Ma niwazên  
Eskeron Tırkon!

**Hûmanê Çıyan**



## NIZANIM AX KÛDA HERIN / Eskerê BOYIK

Nizanım ax kuda herım  
Lı vê dınya nerehet,  
Hev ketına qewm û pısmam,  
Betal bûne soz û bext.

Milet lı hev bûne agir,  
Din şıyar bûne ziyayê reş,  
Lêne remê hûfi xwekın.  
Lêne bıgrın erf û erş.

Bına xûne her dera tê,  
Gur ketine nava pez,  
Qewlê gurtiyê bûne qanûn,  
Xwerazi û xweparêz.

Tine tu şewq xwe lê bıgrım,  
Ziyaret tune herme ber,  
Xwe kê dıgrım qelp û kının,  
Derewının sewdeser.

Divê rastiya mın ji şaşê,  
Steyrka mın pûçe, qelp,  
Nav qafa da hê mar hene,  
Şeverêşê here telp.

Hela hene, hê qewine  
Colê qûltiyê giran,  
Şûrê DİN hê fêza şûrê  
MİLET da tê girêdan.

Nizanım ax kuda herım  
Rê girtine, bê amın,  
FELEK mala te ava be  
Ev çı BEXT bû te da mın.

20.04.1992

## SAMET AYDIN:

## "YARATICI VE ÖZGÜR SANAT, TOPLUMDA HER ZAMAN GELİŞİM VE DEĞİŞİM FIKRİNİN LOKOMOTİFİ OLMUŞTUR."

## Neden resim?

Zena' at ile San' at' in birbirinden ayrıldığı günden beri; Sanatçının içinde bulunduğu devimin, duyarlılık ve sorumluluk özdevranışı, onun kendini ifade ede orjinal ve bağımsız bir yaşam tarzı olan "sanatçılık" ve özelde de "resim" benim için bir yaşam tarzıdır diyorum. Yine bu varoluşun nedenini sorarken sonucu gözardı edemeyiz. Onun için "Varım Öyleyse Düşünüyorum" diyemem". "Düşünüyorsam-yaratıyorsam Varım" diyorum.

**Temel sanat görüşünüz nedir, etkilediğiniz veya size**

## Portre: SAMET AYDIN

Geleneksel bir mela baba ile ağa kızı an-neden dünyaya geldim. Çocukluğum Çaldıran'dan Diyarbakır'a uzanan geniş bir coğrafya da dolu dolu geçti. Dinsel ve mitolojik hikaye ve müzik içinde geniş bir gözlem imkanı ile "kendimce" geliştirdim, serpildim. Şunu rahatlıkla söyleyebilirim; kendimi evrenle yaşatmışım gibi hisediyorum. Yada klasik ifadeyle; 1959 doğumluyum, 60' ların radyodan duyduğum infaz ihtiram marşlarını hatırlıyorum. 70' i de 80' i de.

İlk, orta, lise öğrenimimi şehirde yaptım. 1980 de İstanbul Devlet Güzel Sanatlar Akademesi Yüksek Resim bölümünü kazanarak sanat öğrenimine başladım. 1987 yılındaki mezuniyetimin ardından tekrar Diyarbakır'a geri döndüm. Bugüne kadar birkaç karma resim sergisine katıldım. Daha ortaokul yıllarımdan itibaren başlayan bilinçli ve disiplinli sanat yönelişimle yaşamımı sürdürmekteyim. Uluslararası yayın yapan bir ansiklopedinin Türkiye versiyonunda biyografyam yer almıştır.

**yön veren, sanatınızı temellendiren diyalogları anlatırmısınız?**

Benim esin kaynağım gezegenimiz ve içerisinde yer aldığı kosmostur. Tabii duyularını aldığım bu kompleksten bir parça olan insan, beni en çok ilgilendiren başlı başına bitmez tükenmez bir kay-

naktır. Hiç bir canlı yoktur ki bu kadar kompleks olsun; Doğasında ta milyonlarca yıl öncesine ait ilk atalarının en naif en barbar en ilkel en vahşi tabiatının yanında profesyonel, uygar, çağdaş ve hümanist tabiata haiz bir doğaya sahip yaratık daha olsun. İş böyle olunca sanatta durağanlık, yeknesaklık, hazımsızlık ve pasivizm söz konusu olamaz. Günümüzden geriye baktığımızda sanatın kat ettiği, daha doğrusu geçen zamanın insanın sanatsal uğraşlarında yarattığı değişimleri kimi zaman buruk, kimi zaman hayal kırıklığıyla karşılarız.

Örneğin; bu bizleride yaratıp tüketen evrende insanı yeterince tanıyamamış olmak ve bunun sonucunda bugüne kadar kah merkeze alınan kah dışına itilen ve böylece hiç bir zaman yeterince değerlendirilmeyen kozmik insan.

İnsan konulu eserlerde insanı direkt olarak işleyebilecek tek yöntem, bence sanatçı insanın önce kendini tanımasıdır. İfadede yalın, samimi özentisiz, duyarlı çok yönlü ve yetkin olmakta işin sırrıdır.

Örneğin: Evrensellik uğruna ihmal edilen orjinalliğin karşıtı taklittir. Herkeste bulunan fizyonomik duyum organlarının aldığı farklı çevresel, ruhsal ve moral uyarıcı frekanslardır. Anlamı farklı kılan, özgün kılan evrensellik buradadır bence. Tarihteki bazı çarpıcı örnekler bunu kanıtlar. Coğrafya, iklim, ırk ve moral değerler açısından

birbirlerinden izole edilmiş insan topluluklarının farklı ve orjinal uygarlıklar, insanın kendi gerçeğini tanıdığı

neler yaratabileceğini gösterir. Aztek, Maya, Mezopotamya, Mısır uygarlıkları (bugün yakıştırılmıyorsa) onu yaratan dönemin yerel topluluklarıdır. Mısırlı Hiyerogfi, Mezopotamyalı Çivi, Amerikalı sembollerle kaligrafik ifade araçlarını yaratmışlardır. Burada evrensellik ifade ve iletişim zorunluluk istegindendir.

Şimdi tüm bunlardan sonra bir sanatçının; sanat tarihi; zamanla gelip geçici "akımlar" ifade üslupları ve üstyapısal şartlandırmaların yarattığı

popülist eğilimlerin etkisiyle gerçek anlamda bir şeyler yaratıp yaratmadığı ortaya çıkıyor. İnsan kozmogonisi ve çevresel gerçeklikler doğru bir teknikle birleştirildiğinde her zaman bir akım veya yöntemin yetmediği hatta bu tür yaklaşımın işin doğasına aykırı olduğu görülecektir. *İşte sanatım: Evrimin benim hissemeye düşenin ifadesi.*

### Sanatın ve sanatçının toplumsal özgürleşme sürecindeki rolü nedir?

